-Ji beriya sedsala 20'an çu berhemên rêzimanî li nik Kurdan nebûn. Berhemên kalsîkên me bi hemî beşên xwe ve ta çi astê bi bend û rêzikên ziman re diguncin?
Dema ku mirov berê xwe dide klasîkên Kurdî, mirov dibîne ku di nava wan de jî yekgirtinek pêk hatiye, bi taybetî jî devoka Cizîra Botan.
Gava ku mirov bala xwe bide berhemên klasîk ên ji sedsala 15'an hetanî sedsala 20'an, piraniya berhemên klasîk bi zaraveyê Kurmancî ne.
Îcar di wan berheman de standartbûneke wan a nivîsandinê heye, û zêdetir devoka Cizîrê bingeh hatiye girtin.
Eburehmanê Axtepî ji Amedê bûye, lê dîsa bi devoka Cizîrê nivîsiye.
Dibe ku di warê rêziman de ew hewldanên xurt nebûne, lê di warê bikaranîna zimên de standartek hebû.
-Eger em dîroka edebiyata Kurdî ya nivîskî bi serdeman bidin polandin, serdema ku herî zêde edebiyat tê de geş bûye, kengê bû?
Dema ku herî zêde tê de geş bûye, ji sedsala 16'an hetanî sedsala 19'an e. Ew jî di dema mîrnişînên Kurdan de bû, dema ku desthilatdariya Kurdan li dar bû.
-Di dema îroyîn de bi dehan ji berhemên girêdayî rêziman derketine, li gorî nerîna we, rêgez û qa'îdeyên rêzimanê Kurmancî ji sedî çi qas rûniştiye?
Dema ku mirov bala xwe dide berhemên ku derketine, bi awayekî zelal cudahî di navbera wan de xuya dike.
Heta radeyekê Mîr Celadet Bedirxan bingehek daniye, lê yên di dema wî de jî ku di heman barî de kar û xebat kirine, wekî: Kamûran Bedirxan, Osman Sebrî, Qenatê Kurdo,Kemal Badil, Dr.Şivan, Feqe Huseynê Sakinc û gelekên din...her yek ji van zimanzanan bi awayekî bala xwe dayê, hetanî termolojiya wan jî ji hev cuda ye.
Lê ji salên 80'yî û pê de, hin pêşektinên berbiçav der heqê ziman de çêbûn, nemaze li Ewropa û bi taybet xebatên Enîstetoya Parîsê.
Piştî Mîr Celadet Bedirxan, devera ku herî zêde min sûd jê wergirtiye Enîstetoya Parîsê ye.
Di salên 90'î de jî bi berfirehî xebatên zimên li Bakurê Kurdistanê dest pê bûn, Bakurê Kurdistanê bandora xwe li Rojavayê Kurdistanê jî kir.
Her çi qas ku yekgirtinek çêbûye jî, lê car dî gelek cudahî der barê termolojî û ravekirinê de hene.
-Te gotibû ku "Nivîskarên Kurd hêvî û daxwazên miletê xwe li ber çavan negirtine, ji vê yekê milet jî berhemên wan naxwîne". Çi ji nivîskarê Kurd tê xwestin, an jî civaka Kurd çi dixwaze?
Mirov nikare vê nirxandinê ji bo hemî nivîskaran bibêje, gelek ji wan hene pêdivî û daxwazên gel li ber çavan girtine, berhem dane û didin jî.
Her nivîskarekî Kurd bi kêmanî, bi qasî min welatparêz e.
Lê dema mirov wê pirsê bike, gelo çima berhemên Kurdî nayên xwendin?
Dibe ku ew berhem nayên xwendin ji ber ku taybetên ziman û civaka Kurdî baş bi dest nexistibin.
Pirsgirêkeke din jî heye ku nivîskarê Kurd ji zimanê serdestê xwe pê ve zimanekî din nizane, divê ku herî kêm kesê nivîskar bi zimanekî cîhanî zanibe da ku edebiyata cîhanî baş binase.
-Ji salên 90'î ve tu bi karê rojnamegerî ve mijûl î. Derveyî babetên zimanî, rojnamegeriya Kurdî çi qasê kariye bi pîşekarî û li gor bend û pîvanên durist tev bigere?
Mixabin di vî warî de kêmasî gelek in, ji ber ku rojnamegerî û çapemeniya Kurdî bi aboriyê ve girêdayî ne û jixwe kesê sermayedar berê rojnamegeriyê destnîşan dike.
Li hemî welatên Rojhilat, desthilatdarî derfetê nade ku kesê rojnameger bi azadî tev bigere.
Mixabin, ragihandina me Kurdan ragihandineke hizbî ye.
Rêxistinên Kurdan dezgehên ragihandinê ava kirine, û karmendên wan dezgehan jî endamên heman rêxistinê ne.
Bi tenê dikarim bibêjim ku li nêv Kurdan ji medyaya civakî pê ve tu ragihandina azad tune ne.
Lê car dî hin hewildan hene.
-Rojnamegeriya Kurdî ta çi

astê xwedî bandor e di warên lipêşxistin û geşkirina zimên de, eynî wê di kuştina ziman de?
Çapemeniya Kurdî ku weşana xwe bi Kurdî dike, helbet xidmeteke baş ji bo zimanê Kurdî dike. Zimanê nivîskî zimanekî bi rêk û pêk û bi pergal e.
Aniha her ku diçe, form û şayesên biyanî dikevin di devoka Kurdî de, lê zimanê nivîskî reseniya zimanê Kurdî diparêze.
Jixwe 3 rêyên serke hene ku dihêlin zimanê nivîskî di civakê de bi cihe bibe: yek perwerdehî ye, ya din wêjekarî ye û ya sêyan jî ragihandin e.
Di warê kuştina ziman de, mixabin gelek caran berhemên nivîskarên me hişmendiya çanda serdestan tê de li kar e, anku wekî wergerê ye.Bi zimanekî din difikirin û bi Kurdî dinivîsin.
Wekî din jî, saziyên Kurdî yên ku weşana xwe bi zimanê serdestan dikin, xizmeta pişaftina zimanê Kurdî dikin.
- Tu çawa li xebatên rojnamgerî û wêjeyî ku li Rojavayê Kurdistanê dibin, dinêrî?
Xebateke wêjeyî ya baş li Rojava dibe, her diçe geş dibe.
Helbet kêmasî jî hene, lê car dî hewldan hene ji bo geşkirina wêjeya Kurdî.
Jixwe Rojava di rewşa dorpêçê de ye û derfet nîne ku em xwe bigihînin wir, ji vê yekê mirov nikare bi kûrahî nirxandinên xwe bike.
Hin nivîskarên Rojava hene wekî nivîskarên Bakur tên hesibandin, ji ber ku sînorê herî destçêkirî, sînorê di navbera Rojava û Bakur de ye.
Tu ferq di navbera Qamişlo û Nisêbînê de nîne...
Nivîskarên wekî Helîm Yûsiv û Jan Dot, em wan wekî Rojavayî nabînin, em li wan dinihêrin wekî ku Bakurî bin.
Helîm û Jan nûnerên rojnameyên Welat û Azadiya Welat li Rojava bûn.
Jixwe min dixwest ez werim Rojavayê Kurdistanê, lê ev nêzîkî 10 salan e ku dewleta Turkyê derketina min ji bo derveyî welat qedexe kiriye, paspora min tune ye.
-Der heqê guhertin û bûyînên ku aniha li Rojavayê Kurdistanê dibin, hûn çi dibêjin?
Şoreşa Rojava hêviya me gişan e.Pirsgirêka herî mezin ew e ku li nêv Kurdan bi xwe de yekgirtineke nîne.
Divê ku Kurd li ser erdê li hev werin.
- Di jiyana xwe de tu li tiştekî poşman bûyî, yan jî tiştek di dilê te de ma û te nekir?
Ez dibêjim qey tiştên ku min dixwestin min kirin.
Li nêv hevalên xwe ez têm naskirin ku zêde kêfçî me.
Ez her tişta bi dilê xwe dikim, ji bo wê yekê jî min pir zêde guh nedaye bend û qeydan.
Hatina Rojavayê Kurdistanê ji bo min xewnek e, mixabin pêk nehat.
-Gotinên wekî : Semsûr, zimanê Kurdî, perwerde, reh û damarên zimanan…ji bo te çi ne?
Semsûr cih û warê min e, ji bo min cihekî taybet e. Lê mixabin ez bi rewşa wê ya îro ne qayîl im, cihê mixabiniyê ye..
Zimanê Kurdî can û ruhê min bi xwe ye. Wekî ku Celadet Bedirxan dibêje" Zimanên din cil û bergên me ne, lê zimanê me çermê me ye"
Ez bi çar zimanan dizanim, lê zimanê Kurdî taybetiyeke xwe heye.
-Aniha her zimanek taybetmendiyên xwe hene, navnîşana zimanê Kurdî çi ye?
Ji aliyê rêziman ve tu lê binêrî, navnîşana zimanê Kurdî ergatîvî ye.
Lê wekî din, zargotin û edebiyata devkî navnîşana Kurdî ye.
Ev her du taybetî, ruhê zimanê Kurdî pêk tîne.
Gotina Dawî…
Ez gelek kêfxweş bûm bi vê suhbetê, ku min karî dengê xwe bigihînim Rojavayê Kurdistanê.
Sipasiya te dikim, gelekî kêfxweş bûm.
Jiyaneke bextewar û azad ji hemî gelên Rojava re dixwazim.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Zimanê Kurdî

Shahînê Bekirê Soreklî

Zimanê kurdî yek ji kevnitirîn zimanên cîhanê ye. Ew beşekî ji çemelên zimanên îranî ye, wek farisî, û ev çemel beşekî ji dara zimanên îndo-ewropî ye.

Heke Kurdan dewlet hebûya, zimanê kurdî dê îroj zimanekî dewlementir bûya û dê bi vî zimanî hejmareke mezintir ji berhemên cudaşêwe hebûya. Li gel ku Kurdan dewlet nebûye û li gel ku stemkariyeke bêhempa li ser zimanê wan hebûye jî, zimanê kurdî ne tenê wek zimanekî zindî, lê her wiha wek zimanekî bi folklora devokî zor dewlemend maye. Li gel hemî kêmasiyên li holê jî, zimanê kurdî di warê berhemên nivîskî de jî, bi taybetî di nav 30-40 salên par de, gavên mezin avêtine.

Li gor pisporan, îroj di cîhana me de dora 6000 ziman hene. Ji wan dora 3000 di tehlûkeya mirinê de ne. Hinek ziman hene ku nuha tenê ji aliyê du-sê kesan ve dihên axaftin. Hemî zanyar û şareza di wê baweriyê de ne ku her ziman divêt ji mirinê were parastin. Hinek ziman ta wê radeyê ji tehlûkeya mirinê nêzik in ku dê bêyî shop wenda bibin, ger peyvên wan nehên nivîsanin û tomarkirin (tescîlkirin).

Wekî tê zanîn Kurdistan di nav 4 welatan de beş-beş bûye. Cîhê dax û mixabê ye ku karbidestên van welatan stemkariyeke mezin der barê zimanê kurdî de domandine. Wan ne tenê fêrkirina vî zimanî di xwendegehan de qedexe kirine, lê hinekan ji wan ev ziman wek zimanekî serbixwe nepejirandine, qerfên xwe pê kirine.

Zimanê milletekî di heman demê de zimanekî mirovahiyê ye. Heke Kurmanc li zimanê xwe xwedî dernekevin, fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe nebin, ev ziman îroj nebe, sibe; sibe nebe dusibe dê bimire. Dema Kurmancî bimire Kurd û Kurdistan jî wateya xwe wenda dikin, çimkî ne Kurd û ne jî gelên din ên li Rojhelatê Navîn êdî nijadên serbixwe ne.

Ew kesên gotina xwîna erebî, ya tirkî ya farisî, yan xwîna kurdî dikin hay ji rastiya zanyarî nînin. Erebên îroj nema yek nijad in, çimkî di nav wan de kesên çermreş, çermspî û kesên porzer hene. Di nav Tirkên îroj de kesên ji paşerehên nijadî yên corbicor hene, ji nijadên tirkmanî yên navenda Asyayê ta nijadên ewropayî. Di nav çend salên borîn de van nijadên ji paşerehên cawaz li gel hev zewicîne. Bi gotineke din, mirov nema dikare wek nijad behsa milletekî Rojhelatnavînî bike, çimkî di nav sedsalên par de li devera Rojhelatê Navîn gellek tevlihevî û guhertinan cîh girtine, ji impiratûriyên Romanan û Yewnaniyan bigir ta hêrîşên Mongolan, ji hatina xaçperestên ewropayî bigir ta karbidestiya dewletên îslamî. Tenê ziman û erf û toreyên van gelan in ku wan ji hev cihê dikin, lê li milê din, erf û toreyên gelên Rojhelatê Navîn jî bi encama îslamê û tevjiyana bi sedsalan pirr nêzike hev û din bûn. Jê bêtir, erf û toreyên tevahiya cîhanê sal li dû salê ji hev nêzik dibine. Ciwanên cîhana îroj di erfên xwe de ji nifşên ber xwe bêtir nêzikî hev û din in û nifşên siberojê dê hîn bêtir ji hev nêzik bin. Lewma, zimanê kurdî ji bo Kurdan hebûna wan bi xwe ye, çimkî kurdî nebêt Kurd jî nînin, heta heke xwe wek Kurd bi nav

Bi hêviya ku Kurd zimanê xwe pêşvetir bibin, bi hêviya ku zarokên Kurmancan bikaribin di siberoja nêzik de di xwendegehên Rojhelatê Navîn de fêrî xwendin û nivîsandina zimanê xwe yê zikmakî bibin, û bi hêviya ku hukûmet û rêxistinên Kurdan, her wiha şareza û zanyarên wan, bi taybetî yên Kurmancan, nirxekî bilindtir bidin zimanê kurdî. Lê erkê herî mezin li ser milên Kurdan bi xwe ye. Heke ew rast ji Kurd û Kurdistanê hez dikin divêt pêş her tiştî li zimanê xwe xwedî derkevin û misoger bikin ku ev ziman ê zindî bimîne, ne tenê ji bo îroj û sibe, lê ji bo sedsalên li pêş.

Bang Bo Romantîkiyê

Azad..A.Z.X

Romantîkî:Bi wateya sawêrî, aşopî (Xeyalî), nimûneyî , mînaketî, hest û ramanên ne girêdayî bi jiyana riyalîzmê ve ye.

Wekî mirov ji xwe re hest bi jiyaneke aşopî, xeyalî û dûrî rewşa mirov tê de dijî bike, wekî mirov, mirovahiya xwe di jiyaneke romantîkî de bibîne.

Wekî mirov her demî hest bi hişkbûna jîwar û riyalîzma mirov tê de dijî bike. Wekî nedadweriya civakî, çavnebariya mirovên wê, nezanîna mirovên wê.

Bênewazî û nenazikbûna wan, paşketina wan, pêşketina wan ber bi nazikbûn û mirovahiyê ve ne diyar be. Şer û pevçûn, û şermezarî diyardeya rojane be. Nearamiya wê, şermezarkirina evînê, ziwakirina hestan.

Wekî mirovê hestnazik, hestyar, evîndar û rewşenbîr li azadiya xwe bigere, di jiyaneke romantîkî de, di riyalîzmeke nû de. Anku mirovên riyalîzma ew tê de, ber bi hovbûnê ve diçin. Lê mirovên jiyana romantîkî ber bi mirovahiyê ve diçin. Anku riyalîzma wan guhêrbar e. Di vir de wateya romantîkiyê ron û diyar dibe.

Civaka mirovên romantîkî bi hêvîdarî dijîn, mirovên wê geşbîn in, li zanînê digerin.

Dema xwe bêhûde û vale derbas nakin, anku dixwînin, dinivîsin.

Bihayê zanînê li ba wan pîroz e, bilind dinirxînin. Mûzîk û awaz li ba wan nirixdar e. Lê guhdarî dikin, bihîstina mûzîk û awazan dermanê derûna xwe dizanin û xwarina canê xwe dibînin.

Rewişt û sinciyên mirov li ba wan pîrozdar in, bi taybet bihabûna keç û jinê.

Mafên mirovan bi rêzgirtin diparêzin, roj bi roj mirovên civaka romantîkî nazik dibin, pêş dikevin, mihrevan dibin, alîkariya hev dikin.

Her kes bi erkê xwe radibe. Spehîbûna her tiştî ber bi hêjabûnê ve bilind dikin.

A ji her tiştî bihatir û giringtir li ba civaka romantîkî EVÎN e.

Evînê wekî ronahî dibînin, bi lêkolînên zanistî li rastiya evînê digerin.

Bi awayekî zanistî, bi felsefî, ol û baweriyên xwe şîrove dikin.

Bi pakbûna dil û canê xwe nêzî Xweda dibin. Bi qanûnên mirovahî tev digerin, anku bi bîr û baweriyên wijdan, ji pakbûna dilên xwe dest pê dikin.

Bo nimûne, bi xêrxwestina di mirovan de ji yaseyên derûna xwe biryar didin.

Xudanê şêwazekî bi rêz in, sînûrên rûmeta xwe dizanin. Azadiya kesane ji azadiya ku Xweda dabû wan didin nasîn.

Azadiyê bi mafên mirov pesend dikin.

Civaka klasîkî:

Nimûne, mirovên kilasîkî ji bedewbûna jiyanê têr nabin. Dixwazin her demî serdema wan neyête guhertin, anku sirûşta riyalîzma xwe ji guherînan diparêzin.

Her tiştên jiyana xwe bilind dinirxînin.

Ji aramî û aştiya xwe dilxweş in.Dîmenên jîngeha xwe bi xweşikbûn û şîwazên kevneşopî ava dikin, ji zanistên serdem ên berî xwe, pê civaka xwe nazik û zane dikin,hestyar dikin, mihrevan dikin, nêzî hev dikin.

Di riyalîzma kilasîkî de, xwe azad dibînin.

Evîn, zanîn û mûzîkê mîna hev bihadar dibînin, di terazûya jiyana xwe ya kilasîk de.

Civaka Kurdî:

Nimûne, civaka Kurdî ne civakeke romantîkî ye; ne jî kilasîkî ye, mixabin sed mixabin.

Civaka Kurdî civakeke rawazperest e, kevneperest e. Mirovên Kurdî bi piranî çavlêker in, çav li hev dikin didin dû hev, çav li çandên biyanî dikin, bihayê xwe winda dikin.

Bandora dijmin li ser civaka Kurdî zal bûye. Mirovên Kurd dîl in, hest û ramanên wan ne azad in, li azadiya xwe nagerin.

Didin li pey xweşiya jiyanê, dev ji bihabûna netewe û welatê xwe zû berdidin. Ji dîmen û temtêla jiyanê hez dikin, ji gewher û naveroka jiyanê hez nakin.

Ji reng û dengvedana zanînê hez dikin, ji gewher û bihabûna zanînê hez nakin.

Ey mirovê Kurd bibe romantîkî, zimanê xwe bixwîne, hêvîdar bibe, azad bibe û li mirovahiya xwe vegere, welatê te mirovahiya te ya zana û serbilind dixwaze.

Bihayê xwe bizane, bihayê te zanîn e.

Dilnewaz bibe, hestyar bibe, nazik bibe ber bi welat ve, ber bi mirovahiyê ve, ber bi romantîkiyê ve.

Bila baweriya te bi romantîkiyê bê, azadiyê bê , serkeftina hêviyên mezin bê.

Rewş dê bête guhertin, ey mirovê Kurd, ey civaka kurd...

Romantîkî: Guhertina riyalîzmê ye, bazdan û reva jê ye.

Romantîkî: Serrastkirina bîr û baweriyên şaş ên mirov û civakê ye, ku hişmendiya xwe pê saz kirine.

Romantîkî: Hêvîdarî û nazikî ye, dijberî rawazperestî, kevneperestî û çavlêkirina şaş û ziyandar e.

Romantîkî: Çareserî ye, da ku takekes erkê mirovahiya xwe, bi azadî rabe.Karê ji wî tê xwestin, anku ji gewher û kakilê mirovahiya wî, ji dil û wijdanê wî.

Romantîkî: Pirensîp e, riya zanistê ye, ji bo rizgarkirina mirovan, ji rawazperestiyê, hovîtiyê, paşketinê û rotîna bêdawî. Anku Romantîkî wergerîn e (Inqîlab e), li ser serdema kilasîkî (kevneşopî).

Romantîkî tenê dikare, dîktatoriya civakî hilweşîne. Romantîkî rewişt û sinciyên mirovan diparêze û bihayê wan bi azadî dinirxîne.

Em diketîne demekê de pêwîst e, jiyan û riyalîzma me bibe Romantîkî, aştî, nazikî, mihrevanî…ji ber ku her tişt tevlîhev bûye, başî, nebaşî û kesên çakîxwaz û kesên bedkar....

Di baweriya min de bîr û baweriyên civaka Kurdî bi piranî şaş in. Hêza civaka sivîl a mirovên Kurd lawaz e.

Asta rewşenbîriya wî di aliyê zanistê de, ber bi jêr de ye. Ev tev encamên bîr û baweriyên şaş ên mirovên Kurd in ku hişmendiya xwe ji mêj de pê saz kirine....

Bang bo Romantîkiyê, da ku em di vê jiyanê de, hest bi mihrevaniyê bikin.....

Bijîşkên Civakê

Mistefa Mistefa

Li welatê Elmanyayê, di dawiya xwendina bijîşkbûnê de xwendekar, û di merasîmin fermî de ku heta bi malbatên xwendekaran jî lê amade dibin, sûnda bi navê ((Abîqirat)) dixwin û di wê sûndê de soz didin ku ew mirov bin berî ku xwe wek bijîşk bibînin.

Tiştê herî balkêş di xwendina wan de, bijîşkên xwe neçar dikin ku karên xêrxwazî berî û di der barê xwendina xwe de bikin, da ku têkiliyên di navbera karê bijîşkî û karê xêrxwazî de xurt bikin, wek tevlîkirina wan di saziyên tendirustî yên bê pere de, ku ev tişt dihêle sincên dilnizmayê û exlaqî li cem wan bijîşkan werin afirandin.

Û ji ber ku karê bijîşkbûnê di cîhanê de karê herî mirovî ye, pêwîst e ku ev bijîşk xwedî wijdan û dilovan be û armanca wî alîkarî û xizmetkirina mirov û civakê be.

Mixabin, îro li cem me di der barê jiyana me ya rojane de, ku gelek caran ji ber sedemên nexweşiyê, em serdana bijîşkan dikin û em dibînin bê çawa ev bijîşk dûrî nirx û pîvanên ku hînî wan bûn di rêya xwendina ku bi dihên salan dom kiribû û çawa armanca wan tenê maye danheviya mal û pereyan.

Em dibînin îro gelek bijîşk rikandinê li ser destbuhaya (heqê) karê xwe dikin, bêyî ku rewşa gelek xelkên xizan û feqîr li ber çavan bistînin û bêyî ku ji xwe re bêjin gelo wê heqdestiya min bi vî feqîrî re hebe yan na, ku ev jî gelek caran dibe sedema ku gelek kes jiyana xwe ji dest didin ji ber ku heqê derman bi wan re tune ye, yan jî neçar dibin ku çarekirina xwe di nexweşxaneyê hikûmî de bikin, ew nexweşxanyên ku dibin cihê zêdekirina nexweşiyê bêhtir ji çarekirina wê re.

Ne tenê wilo, lê belê îro gelek bijîşk gihane asta ku kul û derdên wan tenê maye hejmara nexweşên ku têne li cem wan, ku ew jî dibe wek navûdengiyekê ji bo wan bijîşkan re, tevî kêmjîrbûna wan di karê wan de.

Gelek bijîşkên binavûdeng hene destên xwe danîne ser bazara dermankirinê û tenê heqdestek dane pêş, heta asta ku eger em werin pereyên ku ev bijîşk her roj ji karê xwe bi dest dixe, em bihejmêrin, em ê bibînin ku bi qas mûçeyên sê-çar karmendên hikûmetê derdixe û di dawiya rojê de dide hev û wan dike çenteyê xwe de û berê xwe dide malê, bêyî ku wijdanê wî biêşe û ji xwe re bêje, mane ev pere encama xwêdana van feqîran e, ev feqîrên ku gelek ji wan ji bilî êşa gewdeyê wan, bi êşa betalî û bêkariyê jî ketine.

Rewşa van bijîşkan dihêle mirov matmayî bimîne, gelo ma heta vê astê dilovaniyê ji dilê wan bar kiriye, ma nikarin di heyvê de heftiyekê, yan di heftiyê de rojekê, yan di rojê de du-sê seatan bê pere ji bo van feqîrn kar bikin?!

ma wê çi ji wan kêm be ku piçekî li wijdanê xwe vegerin û destên xwe deynin li ser êşa milet û derman bikin

Ne şaş bû û heqê wî hebû, bavê şoreşa Fransayê (Voltêr) dema got: “Beriya her tiştî divê em bibin Mirov, dû re em bibin Bijîşk”.

700 Name…Jiyana Fînsent Fan Gox (Vincent Van Gogh) Nû Dikin

Kawa Ibrahîm

Ji malê derkeve!

Here ji xwe re li karekî bigere û kar bike!

Bi vî awayî bavê Fînsent ew ji malê qewitand. Di sala 1880’yê de Fînsent berê xwe da Bruksel û li wir (Bi alîkariya abûrî ji hêla birayê xwe “Theo” ve) dest bi xwendina hunerî (şêwekarî) kir, û rengên xwe li ser tabloya xwe ya yekemîn bi cih kir.

Fînsent ji birayê xwe “Theo” pir hez dikir, loma ku çi dikir û çi bûyer pê re derbas dibûn ji birayê xwe (Theo) re dinivîsand û wekî name jê re dişande Parîsê.

“Vincent Van Gogh” di 30’ê Adara sala 1853’yê de li bajarokê “Zundert” ê Holendayê ji dayîk bûye.

Kurê malbateke oldar û dewlemend bû, heya 15saliya xwe çûye dibistanê û piştre xwe dûrî xwendinê kiriye û dest bi kar kiriye.

Piraniya karên wî di warê hunerî (şêwekarî) de bûn. Di sala 1869’an de li kargeha hunerî ya “Goupil&Cie” li Lahayê dest bi kar dike. Di sala 1873’an de diçe Londonê û li heman kargehê (Beşê Londonê) kar dike.

Di sala 1875’an de dîsa li heman kargehê (Beşê Parîsê) kar dike.

Di sala 1876’an de dev ji kar berdide û berê xwe dide Ingiltra (England) û li wir wekî mamoste li dibistaneke olî waneyan dide.

Di sala 1877’an de dîsa dev ji kar berdide û berê xwe dide Amsterdam û dixwaze xwe ji xwendina zanîngehê re amede bike; lê di wê de jî bi ser nakeve.

Fînsent di evîniyê de jî her dem dişikest… şikestinên Fînsent di warên kar û evîniyê de û nexweşiya ku pê ketibû, ew di warê şêwekariyê de gurr dikirin û dihêlan ku gelek şêwe çêdikirin.

Piraniya şêweyên wî li ser cotkar û karkeran bûn, di nava wan de jî şêweya wî ya bi nav û deng (The Potato Eaters).

Di heman demê de gelek astengî didîtin, loma di sala 1886’an de berê xwe da Parîsê û li wir fêrî gelek hunerên nû bû, mîna hunera Japanî ku di çend şêweyên wî de ew rengê hunerî tê dîtin, lê ji ber ku Fînsent ji bajarên mezin hez nedikir biryar da ku berê xwe bide başûrê Ferensayê li bajarê Aril (Bajarê ku gelek şêwekaran berê xwe didanê, lê diciviyan û alîkariya hev dikirin) û li wir jiyana xwe berdewam bike.

Di heman salê de şêwekar (Pol Gogan) nas dike, dostaniya wan di demeke kurt de xurt dibe. Di payîza sala 1888’an de Fînsent û Pol Gogan biryara xwe da ku bi hev re di malekê de bijîn.

Di despêkê de jiyana wan bi hev re baş derbas dibû, bi hev re şêwe çêdikirin, alîkariya hev dikirin, lê wê xweşiyê dirêj nekir û di nav her duwan de aloziyan des pê kir, pê re jî nexweşiya “Epilepsy” li Fînsent zor dikir.

Pol Gogan bi xeyd dev ji hevalê xwe qeriya û çû, vê bûyerê nexweşî li Fînsent pir zor kir, heya ku Fînsent guhê xwe bi gwîzan jêkir (Hin dibêjin ji qehra li ser hevalê xwe guhê xwe jêkir, û hin jî dibêjin ji ber êş û zinzina ku dikete guhên wî de).

Piştî vê bûyerê Fînsent xwe pêş gelek pizîşk û dektoran dikir, gelek caran bi nexweşxaneyan diket.

Nexweşiya Epilepsy lê zor dikir û pê re jî û bi wê rewşê re gelek şêwe çêdikir, piraniya wan şêweyan rûdêmên wî bi xwe bûn.

Di sala 1890’î de Fînsent berê xwe da Parîsê û li cem mala birayê xwe “Theo” ma, piştre berê xwe da bajarê “Auvers-sur-Oise” yê Ferensî li cem dektorekî çareseriya xwe ya tenduristî kir.

Di sibeha 27’ê tîrmeha sala 1890’î de şêweyek çê dikir, nîvco hişt û çek (demançe) xiste sînga xwe û xwe kuşt. Piştî mirina Fînsent bi şeş mehan birayê wî “Theo” jî serê xwe danî û mir.

Tişta herî balkêş ew e, ku di jiyana Vincent Van Gogh de yek ji şêweyên wî nehatine firotin û tev di hustê wî de mane (Dibêjin ku xuşka hevalekî wî dil ketibûyê, û ji bo ku xwe nêzîkî wî bike şêweyek jê kirîbû).

Vincent Van Gogh 840 şêwe çêkirine û dema ku jiyana xwe ji dest da kesî ew nas nedikir. Piştî mirina wî bi çend salan jina (Theo) Ciwana bi karê belavkirina şêweyên tiyê xwe Fînsent rabû û ji 700 nameyên ku Fînsent ji birayê xwe Theo re nivîsandibûn, çîroka jiyana wî bi me da nasîn.

Û îro roj Vincent Van Gogh yek ji mezintirîn hunermend û şêwekaran e, yê herî bi nav û deng e û şêweyên wî jî ji yên herî buha li cîhanê ne.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî...Miş'el Osman

Kewê ribat
Çima felek
Qêrînê ji me tîne
Sitêr firyan
Ji me hêvyê
Destine
Çi bkin
Ji quntara çiyê
Em tên xwehr
Hatin girêdan
Û ew tev gurê har
Ne cî
Ne sîdank
Dimrin ji hejarî
Rê girtî ne
Bi ser de
Rojên tarî
Xwedîxêran
Li me ev dil
Kirin doj
Divan li ber me vedidin
Bi şev û roj
Ez ê bibêjim
Çi bibe ez ê bibêjim
Ji bo ala rengîn
Ez mest û gêj im
Mêvan in
Ji me'r dibêjin
Hûn mêvan in
Li ber çavan
Diçêrin ,
Xweş dizanin
Kelem in
Ji lewra em jî xizan in
Bi Xwedanê şev û roj
Bargiran in
Mixabin
Em j' hev re
Zana û jîr in
Kewê ribat in,
Em ji xwe re kwîr in.

Miş'el Osman, jidayîkbûyî sala 1970'yî ye.
Li bajarê Dirbêsiyê çavên xwe li jiyanê vekirine, û di sala 1987'ê de bawernameya bekeloryayê wergirtiye.

KOÇBERÎ
Perdeyên reş
Hatine dakêşan
Li hemû rêçên bajarê nan..
Tiştekî nabêjim
Ta ketinê..
Der dibin
Hestîyên dost û hogiran
Ji cendekên avêtî
Di qeşayê de..
Westiyame ...westiyam..
Ta qirbûnê
Bihêlin …
Ez di oxirê de
Herim
Bajar
Li paş jiyanê ye ...
Rê dirêj e
Bihêlin …
Bê xatir ez herim
Sûnda min ji we re ...
Bi kaxezên li ber ba dibin
Bi xurcika min î
Ji peşkên xewnan..
Ez ê çavan bigirim
Û bêdengîyê bikerritînim..
Lê naxwazim..
Bi çûnê…
Rojyarê şiyar bikim.

RÊLA KELAŞÊN BÊGUNEH
Binefşek
Di qiraxa ceger de
Min tu çandî,
Hêlane
Di pêçîyên rojgarê de..
Ax ... hevala min
Bihêle ... da ku ez
Gorinekê ji heyamê re bikolim
Di kizkirina Mem û Zînê de
Û gorinek din ji nokeran re
Di bêdengîya Çarçira ya avis de.
Rojekê , berbangê got:
Jehr dildarê qerqera ye
Helebca ...
Şêtbûn û xerdel
Xencerek efsanî
Ji evînek nazdar re
Derbas dibe zindanan
Axîna dîwaran
Derbas dibe germahîya
Bêganî û sînoran.

Ji ciwaniya xwe ve Miş'el dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî dike.
Bi hostayî, hest û siruşa xwe bi Kurdiyeke petî di malikên helbestê de bi cih dike.

AMÛDÊ
Gava tu pêçeyên wê
Rûpel dikî
Çîçekan vedirisînî.
Wê gavê …
Dîrok digirnije
Kelogirî dibe
Karwanên kulîlkan
Bi agir dorpêç bûn
Pencera rizgarîyê
Bîra xapînok
Di keşwera (Şehrezad) de
(Xezalî û Mutenebbî)
Di bîra min de tînin
Hêsir ... xwîn ... xak ...
Li qiraxa girê "Şermola"
Mihemedê Se'îd axa..
Dayika Ferîda
Di bîra min de tînin ...
Qeşaya dilê min tê bişavtin
Û Amûdê kulîlkan vedirisîne..
Wê gavê..
Reng dibişkivin
Şevbuhêrkên buharê
Bênderên pûş
Lîstika çavgirtînkê
Seven zivistanê
Qêrînên li ser sînoran
Qêrînên di kolanan de
Hawaro , Xelefo
Bavê Babil, Azado
Û hîn qeşaya dil
Tê bişavtin
Çavkanîyek evîn
Çilmisî
Hêlîna zaroktîyê
Û hêsirên roja oxirkirinê
Tevî aso winda ye
Bûm kalê zemanan
Çavan vedikim
Te nabînim.

DILOPÊN EVÎNÊ
Di kûrahîya dojeha bêganîyê de…
di çalên rojgaran de…
Bi viyana te
Kanî dibişkivin…
Bangora bendewarîyê
Li ser sufirneya
Ramanên min
Diherike
Dergehên paşerojê
Kor bûne...
Zengilê mizgînîyê êrîşî
Omîdên min dike..
Dergehek hate perçivandin
Bi viyana te
Rûbar hate suhtin.
Dilopên ku der dibin
Ji derya ya şînewîya
Çavên te
Perwana bîranînê difirîne.
Ji biskên te
Kavi l hişyar dibin
Û berbang diçirise.

BERBANG
Kanîyên bêbeşîyê
Û bêrîkirinê
Dil gûrtir dikin
Bêdengî belawela ye
Dûman û volkan
Simbil bi xwîn û kulîlkan
Tê avdan
Yê tihnoyî hildimijîne
Ta hişkbûnê.
Zingînî deng vedide
Li asoyên ronîkirî
Bihna pêxwasan
Evîndarîyê
Hembêz dike.

EYŞÊ Û DEM
Belkî rojgar
Rojekê
Bi me re bigirnije
Dîwarên biyanîyê
Û pîrhevokan wêran bike
Wê gavê ...
Em ê goçên xwe
Berhevdin
Dojeh û tewşbûnê
Belawela bikin
Hêêêêê ..şahjinê
Bijardeya xewnê
Li ser textê tîbûna min
Weyla li çavên te yî çilmisî
Gava tu pagenda xewê
Ji ser wan hildiweşînî.
Çawa bi dûrbûnê
Te bigirînim …
Û şînewîya çavan
Derya dixemilînin..!!
Hindek ji rondikan
Kevneşopa derda ne..
Û yên dîtir
Bazara germbûnê
Bi dêman re dikin..
Lêvên girnijîn ji wan
Der dibin
Peyamberî omîda ne..
Ez ê bêm
Û bêm..
Ji dilsojîya te ..
Dil hemû navendên hêvîyan
Dixwîne ..
Dive xewnên me
Ji kulora nan firehtir bibin ..
Ez ê bêm
Û bêm..
Tiştê ku min çinî
Ji dewlemendên reş û rût
Belengazîya min e..
Bextreşîya min e
Bila diyarî
Demê be…

HÊVÎYEA MIN Î TÊKÇÛYÎ
Gava rojgar
Me bavêje
Heldêrê …
Ji bilî her du çavên esmanî
Nabînim …
Ez ê di wan de xwe veşêrim
Bihna dawî
Bibarînim …
Û bin-av bibim.

Di helbestên xwe de, Miş'el Osman bêhtir giraniyê dide êşa civaka xwe û bi awayekî nûjen, hemî bîranînên xwe li pêş xwendevanan radixe.
Di warê wergerê de jî xebata Miş'el heye…Du şanoyên Erebî, wergerandine zimanê Kurdî û dema ku li şanogehê hatine lîstin jî, xelat wergirtine.

BIYANÎ
Zuhabûna rojan
Dibînim
Hino hino bi awazan re
Derbasî şahnişîna
Derdê min dibe
Wê belawela dike
Gûr dike
Dojeh im ez
Bîranînên
Wekû zilindarê
Dadiqurtînim
Tirs der dibin
Ji dîwarên bêdeng
Lê gava dinalim
Ji nalîna min ditirsin
Bêdengî rojên min
Heldibijêre
Yên têkçûyî
Û yên winda
Bi tena xwe me
Ji dûrîyê tême bivaştin
Meya di binê piyalê de
Û gulên ku çilmisîne
Li hawîr min
Çira ku perperîk disotin
Şewqa wê bi dizî



Dîwarên bêdengîyê û
Tarîyê derbas dike
Da ku rûpelên hêvîyê
Ronahî bike
Geş bike.

HESEKÊ
Li jor
Heyv tovên bîranînan geş dike
Û balafir jî di tarîyê de
Dastanên wêranbûnê
Bi tîrêjên agir dirêse
Stêrkan vedimirîne
Bajar vala ye…tengezar e…
Dergeh girtî ne
Ne çivîk
Ne kevok
Pisîk li kolanan jar û mest in…
Hechecîkan hêlîn hiştine
Zarok li pey goga tirsê
Xwê didin
Ma ev çi dunya ye looo
Bazirgan me zorga kirine
Rojane sed carî me dikujin
De ka em dewranê vegerînin

Mêrxasekî digot:
Em ê wan bikin bênder
Wan bişewitînin
Tenê wê poz li jor bimîne
Gelo çend siwar di vê toşê de
Bemired çûn?
Karwanê herî dawî
Buhar û
Ew qirşika bi tenê dizîn
Û çûn
Li ser sînor xewna azadîyê
Raxistin û çûn
Ji mêj ve, çemê Xabûr û Ceq-ceq
Nema xumxum ji wan tê
Bo çavên ku zuha bûne
Jiyan nema xweş e looo
Her şev sî û sê gulle
Ser gulên çilmisî dibuhirin
Û tirafa darê qizwana
Ji çiyayê Homan
Digihêje Kewkebê Millan
Dengê şûr û mertalan
Brahîmê Paşê şiyar dike
Derwêşê Evdî li deştê winda dibe
Fermanan dihejmêre...
Qêrîna Edûlê erdê diqelêşe
Kêra xiniz di dest de ye
Bo viyana dijwar dibêje :
Ji te hez dikim Derwêşo
Ji te hez dikim welato
Û ji bo roka di nîvê alê de
Va ne şervan nehtorê
Çem û çiya ne.

EVÎNEKE RAZAYÎ
Di çavên te de
Jiyaneke derewîn dibînim
Ji dûrbûnê
Hatime ji tunebûnê…
Bendewarê sozê me lêêê
Ma çi qas dev li hêvîya
Parîya ne
Koletî …mirin
Rengên xwînê
Li pey xwe dihêlin
Kolanan dixemilînin
Bapîrên me tirs hiştin
Kuştî têne kuştin
Sor tevlî şînbûna avê dibe
Xurtbûna zanînê
Rastiyê tîne…
Û evîneke razayî şiyar dike.

Berhemeke Miş'el der heqê jiyana Nemir Mihemed Şêxo de heye, tê de hemî qonaxên jiyana Mihemed Şêxo bi hûrgilî hatine rêzkirin.
Jê û pê ve, dîwanên Miş'el ên helbestan bi zimanên Kurdî û Erebî hene, aniha li ber çapê ne...

CANGORÎ
Di dilê min de
Çiyayên bilind
Li jor wan qebqeba kewa ye
Di dilê min de
Çem û rûbar
Li ber lehîyê
Qeder avjenîyê dike
Ji boyî wan
Bajar canvejîn in.

ZÛ WERE
Dûrbûna te jiyanê
Ji min dûr dixe..
Bê te
Di çalên kûr û tarî de
Wer dibim
Di nav pêlan de
Di hev wertêm
Êş û jan li ber ba dibin
Hembêzkirina bi çavan
Kanîya der dike
Li ser baskên hêvîyan
Esmanan diçirînin
Zû were…
Em bi hev re dûrkevin
Çal kûr in wê hêvîyan
Basko bikin
Di dilê min de
Sînema û zindan,
Xerdel û Enfal,
Xwîna pêxwasan,
Û xwêdana penaberan
Nû min naskir
Çima di şoreşê de
Leheng bûm,
Çima perperîk
Xwe li ronîya spî digre
Çima bê te nabînim
Pêlên xewnan di şiyarbûnê de
Beyhûde dikim
Li te digerim
Carinan , xwe vedişêrim
Lê winda dibim..
Çend sal bûrîn
Tenê şeş caran
Te kir qêrîn
Te ha ji çavê min heye ?
Ez li ku me ?!
Hevalên xapînok
Çi davan li ber min vedidin
Yên din,
Koçberîyê ew revandin
Dengvedana welatê min
Bêdengîya min didize
Çav li rê riziyan
Û karwan hîn û hîn diçin
Hêlînê ji kê re dihêlin looo…
Ji ber çavan dûr dikevin
Ma kî yê gul û sosinan
Av bidin looo… ?!!
Tevî ku min rojek xweş nedît
Rojan dilorînim looo
Û hîn çîrok dest pê nekiriye.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kurdî Xweş e

Romal kirin	تغطية
Şopandin	متابعة
Nirxandin	تقييم
Polandin	تصنيف
Dabeşandin	تقسيم
Pelandin	تصفح
Lêhûrbûn	تدقيق
Dahûrandin	تفكيك
Jêgirtin	إكتساب
Nimandin	تشبيه

Gotinên Pêşiyan

-Dara tu berê wê nexwî, av nede
-Hesinê sar, bi hilmê gerim nabe
-Dizê malekê kurmê darekê
-Mezin qedrê mezinan dizanin
-Çiyayê bilind ji cîranê xerab çêtir e
-Însan pola ye
-Golika xwe bi gayê xelkê mede
-Qada bêxwedê, ware guran e
-Nebêje tu kî bû, bêje niha tu kî yî?
-Serê merdan her bilind e

Pirsname

-Firindeya ku girêdayî çand û kevnetora Kurdan e?
-Bavê geşkirina hestên Neteweyî li rex Kurdan kî ye?

Bersiva Pirsên Çûyî

-Emerê Lalê di sala 2011'an de koça dawî kir.
-Yekemîn kurteçîroka Kurdî, Fuwad Temo nivîsandiye

Mamik

- Şikefta yek derî, tê de hene sîh û du kevirên spî...
-Lat û lat, min pê tev da evqas welat...

Bersiva Mamikên Çûyî

- Çente ye
-Tizbî ye

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1									
2						■			
3							■	■	
4			■		■	■			
5				■				■	
6		■			■	■			
7						■			■
8				■					
9	■								

Sitûnî
1-Warê miriyan
2-Dewleteke Ereban_ Ji rengan (Vajî)
3-Mar belavkirî_Akadi (Vajî)
4- Mizgevt_Xwarina ajalan
5-Ji rojên hefteyê (Vajî)_Dîk belavkirî
6-Du tîpên wekhev
7-Du tîpên wekhev_Mirîş belavkirî
8-Detpêka nexweşiyê (Vajî)_m.m.e.i belavkirî
9-Bilindkirin (Vajî)_Du tîpên wekhev

ASOYÎ
1- Welatê Gurciyan
2-Dehil(Mêşe) bi Turkî_Tat belavkirî
3-Mardîn belavkirî
4-Du tîpên wekhev_Temenmezin
5-Sin belavkirî_Pîr belavkirî
6- Hevjîna bav_Porbir bi kar tîne
7-Aştî_ Qeratfa Cînavka "ez"(Vajî)
8-Mala koçeran (Vajî)_Meşhed, menzer
9-Cemidandin

Amadekirina Xaçepirsê: Îsa Bavê Siwar

Li Sînê (Çîn)...Qaz Asayîş e û Xwarina Goştê Kûçikan Bextewarî ye

Şaristaniya Sînê (Çîn), ji zengîntirîn şaristaniyên cîhanê ye, paşxane û mîratekî xwe yê gewre di hemî zanist û huneran de heye.
Lê bi domana lêkolînan re, hin tiştên veşartî û ne li ber çav ku di jiyana Sîniyan de cih digirin, diyar bûn.
Ji wan jî em ê 6 tiştên seyr û sosret ji we re rêz bikin:
1_Qaz Asayîş e
Li hin deverên Sînê, ji dêvla ku kûçikên polîsî bên bikaranîn, navendên polîsan qazan di muheme û sitûbariyan de bi kar tînin, ji ber ku cûreyekî qazan li nik wan heye gelekî dirinde ye û çavên wan zêde xurt in.
2_Festîvala Xwarina Guştê Kûçikan
Kêfa Sîniyan gelekî ji xwarina goştê kûçikan re tê, ji ber ku Sînî bawer dikin ku xwarina goştê kûçik bextewarî ye û hêza mirov jî xurt dike.
3_ 35 Melyon Çînî...Di Şikeftan de Dijîn
Li gorî lêkolînerên Sînî, hîn jî planeke dewletê tune ye ku van welatiyan ji şikeftan derxînin.
4_ Kevokên Peyamnihêr
Ta roja îro jî, Artêşa Sînî kevokan ji bo rêkirina peyaman bi kar tîne.
5_ Rêyeke Taybet ji bo Bengiyên Telefonan
Ji ber ku bikaranîna telefonê di cadeyan de gelek qezayan bi xwe re tîne, Hikûmeta Sînî li ser redîfan rêyeke taybet ji bo wan kesan veqetandiye ên ku bi berdewamî telefonê bi kar tînin.
6_Hevjîniya bi Miriyan re
Jin û mêrên Sînî dikarin bi awayekî qanûnî bi miriyan re bizewicin, ev jî kevneşopiyeke gelê Sînî ye.

Sitêrname 3

Narîn Omer

Meryem Xan jina leheng û hêzdar e, ya ku li hember rewişt û yasayên civakê yên şaş û çewt raweştiyaye, û hebûna xwe wekî jineke jîr û zana eşkere kiriye.
Ew li gundê Dêregola Botan a Bakurê Kurdistanê di sala 1904'ê de ji dayîk bûye.
Bi rastî gelek çîrok li ser jiyana wê têne gotin...hunermend Se'îd Yûsiv dibêje: "Meryem Xan cêriya mala Eliyê Remo bû mezinên êla Çilikên Eliyê Remo û Hevêrkan, û wê sitran li ser wan gotine, û şîna kurê wan Mihemed Selîm bi dengbêjî kiriye." wî ev gotin ji dayîka xwe bihîstine.
Hin dibêjin: Ji ber derfetên zor û xirab ew ji cihê xwe koç bûye, li Dimeşqê bi cih bûye, dil ketiye mîrek ji mîrên Bedirxaniyan, û bi wî re şû kiriye, lê şûkirina wan berdewam nebûye.
Jêderên din dibêjin ku ew ne cêriya mala Eliyê Remo bûye, belê ew xatûna malbata xwe bû, û şîna wê li ser Mihemed Selîm ji ber mirovatiyê bû.
Ji Şamê berê xwe dide Dêrika Hemko û derdorên wê, mîna gundê Indîwerê, piştre berê xwe dide Bexdaya paytexta Îraqê, li ba dotmama xwe Elmas Xan.
Di wê demê de Beşê kurdî di Radyoya Bexdayê de vebûbû, ew tevlî dibe, û sitranan tê de tomar dike heta ku dibe Seroka Beşê Kurdî, û nav û dengê wê li hemî dever û hêlên Kurdan belav bû .
Meryem Xan yekemîn dengbêja Kurd e ku bi zaravayê kurdmancî dengê xwe li ser Qewananê tomar kiriye.
Wê pir xizmet ji folklor û çanda Kurdî re kirine û sitranên winda û veşartî eşkere û diyar kirine.
Li ser welat, li ser gelê xwe, li ser sirûştê, li ser kesayetên navdar û leheng û li ser jinê sitrandiye.
Bandora wê li guhdaran hebû,

Meryem Xan Xatûna Hunera Kurdî

ji ber ku wê ji dil û can, ji jan û êşên xwe û ji evîniya xwe ya rast û kûr, disitrand.
Dawiya wê:
Mixabin, diyar e ku hestên wê yên nazik û dilê wê yê pak, nekarîbûn barê êş û jana wê hilgirin, ji ber vê yekê nexweşî lê civiyan, can û cendikê wê dorpêç kirin û di gurbûna xortaniyê de li sala 1949'ê li Bexdayê ew bêgiyan hiştin...çirûskên temenê wê vemirandin, lê giyan û dengê wê man nîşanên lehengî û dana wê ya bêhempa.

Pêkenok

Mirovekî aqiltewş û kawikî hebû, hemî tiştên wî vajî yên xelkê bûn.
Carekê dikir ku ji malê derkeve, deriyê xaniyê wî hişk bûbû û pê re venedibû...Deriyê xênî ji ber kir, derî li milê xwe kir û çû bal ê necar ku deriyê wî çêbike...
Dema ku li kolanê dimeşe û derî li milan e, zarokekî ew sekinand û jê pirsî: Tu yê bi kû ve biçî?
Gotê: Ez ê deriyê xwe bibim bal ê necar ku çêbike.
Wî zarokî jê pirsî: Te deriyê malê ji ber kiriye, ma tu natirsî ku diz bikevin xaniyê te?
Ê kawikî ji kena zikopişto bû û rondikên wî ji kena re herikîn, û ji wî zarokî re got: Wê diz çawa derbasî xanî bibin û deriyê xanî bi min re ye?..!!

Mirovê Kawikî



Serpêhatî

Bersiva Xaçepirsa Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	b	a	w	e	r	m	e	n	d
2	a	j	a	l	■	m	e	r	d
3	d	a	w	i	d	■	■	u	■
4	a	n	î	■	e	h	m	e	d
5		■	k	a	r	g	e	h	■
6	■	a	■	s	e	r	d	■	d
7	r	ş		■	w	ê	r	a	n
8	a	t	a	t	u	r	k	■	a
9	p	î	d	a	n	b	e	r	■

Tu Çi Bikî Wê Bêye Pêşiya Te

Zivistanê li zozanan, şeş mehan berf li erdê dimîne.
Terş û tirûşên wan di govan de ne. Gur ji birçîna re bi çola dikevin, tên guhê gundan belkî heywanekî bibînin ko bixwin.
Şevekê pazdeh gur pev ketin û hatin gundekî, di ber xanîkî re derbas bûn, dîtin ko di kulka paş re hilim û bîna pez tê. Rabûn di wê kulkê re xwe avêtin hindir û ketin nava pez. Bi wî pezî ketin û yên kuştin ên xwarin, tev berebat kirin.
Hayê xwediyê pez ji vî tiştî tune. Serê sibê ew û kevaniya xwe rabûn rahiştin hinek rêsî ko li ber pez deynin. Dema deriyê hindir vekirin çi binerin ko pez tev de li erdê ye û pazdeh guran li dîwarê paşî pişt dane hev û çavên wan diçirisînin.
Wek pilingan hêdî derî girtin û kirin hawar li gundiyan û gotin: Mala me xera bû, em talan bûn, guran tiştek di pezê me de nehiştin.
Gundî bi hawara wan ve hatin, dîtin tev de rast e. Kalên wan li hev rûniştin ka wê çi bikin, yekî got: Gelî bira gur ketine zevta me ji ber ko dîwarê paşî bilind e nikarin di kulkê re derkevin, de rabin em ê pazdeh kûçikên zozanî yên gurxenîq bînin û bera nav wan bidin.
Rabûn ketin nava gundiyan, kûçikê gurxeniqîn anîn û bera nava wan dan. Kûçik jî li hember wan pazdeh bûn. Li hember hev sekinîn û di bin çavan re li hev dinêrin yek a xwe di yê dî re nabîne ko êrîş bike; ji ber ko yek ne zêdeyî yê din e. Gundî li benda wan in ka dê çi di nav wan de çêbibe. Bi vî rengî ji sibê heya nîro wilo man a xwe di hev de nedîn.
Yekî qereçî hat bûncîkî wî bi dû wî de ye, pirsî: Ka çawa bû?.
Gotin: Hê tiştek nebûye.
Yê qereçî got: Wilo nabe divê em gelaciyekê di nav wan de bikin. Rabû bonciyê xwe di kulkê re avêt nava wan, hema boncî xwe gal kir gurekî, bi yaqê wî girt, vegijgijand û kir şîqeşîq, gur jî bû borebora wî û li ber xwe da, ji nû ve kûçikan êrîşî guran kir.
Her dû jî bi hev ariyan. Demeke pir neçû, kûçikan her pazdeh gur xeniqandin, paşê derî vekirin, laşê her pazdeh guran û laşên pezên mirarbûyî avêtin çolê. Gundî rabûn wek camêran bi qasî pezê wî jê re pere dan hev.

Herwekî Tîrêj gotiye:

Ne ko j' yê bêguneh kuştin cefa ye
Bizan xwînî silamet naçe gorê
Hezar dost hindik in lê yek neyar e
Ji ber haj xwek mekev wê xefk û torê.